Newroz

Dr Nûredîn Zaza
1919- 1988

Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo : * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe .
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan .
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de .

Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê - YEKÎTÎ

Hejmar (99-100) sal 17 Berçile 2011 z - 2623 k Buha (15)ps

Sazûmana Beşar ElEsed Di navbera Guhertin û Ketinê de?

Li nîvê meha yekê ji sala nû 2012an, deh mehên bi xwîn û kuştin di ser gavavêtina destpêkê ya serhildana gelê Sûryê re derbas dibin.

Li destpêka raperînê, û li ber roniya serkeftina serhildanên gelên Tûnisê û Misirê, hêvî li ba nofeke mezin ji gel û hêzên siyasî yên Sûrî jî bilind bû, naveroka hêviyê digot: Dê li Sûryê jî sînaryoyeke mîna ew herdu şoreşên serkeftî li dar bikeve, û serok komar Beşar ElEsed yan dê bi pişikdariya hemî hêzên siyasî yên azadîxwaz û demokratîk, ligel nûnerên gel yên rastînkî, û li ser daxwazên wî yên rewa, guhertineke demokratîk û îjdil di bingeha sazûmana xwe de çêbike, yan jî dê di bin zixta xwepêşandanên gelêrî yên sivîl de, mîna Z.Bin Elî li Tûnisê û M.Ĥ.Mibarek li Misirê bike, ew jî postê serokatiyê berde û bihêle gelê Sûrî yê mafdar qedera xwe bi destê xwe bajo.

Gelek hêz, rêxistin û kesayetiyên rikber ên demokratîk û nasraw di wê baweriyê de bûn, û helwestên xwe yên destpêkê li ser bingeha wan nêrîn û hêviyan danîn. Ta radekê, gelek alî û hêzên Sûrî yên girîng, helwestên xwe di warê guhertinên siyasî û hêzên Sûrî yên **D.R.(11)**

Pr. Î. Şerîf Wanlî
Konê Reş 3

Li Derdor û Perawêza… 4
Dr.Ebdilmecît Şêxo

Ji Kurdan re Çend Pirs 6
Riza Can

Sînorên Rêzgirtinê 9
Enehîta Morad

Email : Newroz 95 @ hotmail . com

www.arsivakurdi.org

Sersaxî

Îsmet Şerîf Wanlî Ji Bîr Nabe

Bi êş û keser , bi dilên xemgîn , nûçeya koçbarkirina rewşenbîr û siyasetmedarê mezin Prof. Ismet Şerîf Wanlî gihabû me . Bila miletê Kurd sax be , dost , heval , meriv û malbata wî xweş bin .

Ismet Şerîf li dirêjahiya heftê salî , bêdudilî , bi hişmendî , bi dil û can , di ber doza netewî ya gelê xwe yê Kurd de dixebitî , .. Û ji ber rola wî ya balk bêtirî carekê dihate ber kuştin

Ew ne tenê ligel yên weke Dr. Kamîran Bedirxan , pêşewa Mile Mistefa Barzanî , Dr. Qasimlo , Mûsa Enter , Osman Sebrî ,

Nûredîn Zaza , Dr. N.Dêrsimî , Hemreş Reşo û Reşîd Hemo têkildar bû , ew ligel bi sedan ji perlementêr , rewşenbîr û siyasetmedarên Ewropî xwedî dostanî û têkliyên bi rêz bû .

Ismet Şerîf di nav Kurdan de , bi zanyarî û rewşenbîriya xwe , bi dilgermî û hişmendiya xwe , bi nivîsar û berhemên xwe yên akadîmîk bêhempa bû , û mirov dikare wî bide ber welatparêz û rewşenbîrê Filestînî Prof. Idward Se'îd û yê Firansî Alpêr Kamo .

Ismet Şerîf kurdhezekî aştîxwaz , azadîxwaz û wekhevîxwaz bû .

Ew dê ji bîr ne be .

Em bejna xwe li ber wî ditewînin .

Bila hûn xweş bin .

Heleb 11.11.2011

Heval Ebdurihman jî Barkir

Êvara 06-12-2011 an, li gundê Qujûma – herêma Kurdaxê, dilê Heval Ebdulrihman Mistefa radiweste û ji nav me bardike. Roja dî bi beşdariya xewdî, gundî, dost û hevalên wî li goristana Qujûma tê veşartin û li ser gornê hevalekî wî gotinekê li ser sinc , dilsozî û kurdperweriya wî ji berşdaran re dide xuyan.

Hêjayî gotinê ye, ku heval Ebdul-rhman ji destpêka salên 80î ve, derbasî nav refên tevgera Kurd dibe û bi dilsozî û cangorî ta, dawiya jiyana xwe xebata xwe berdewam dike.

Bila serê xwedî,dost û hevalên wî saxbin.

BirûskaSersaxiyê

Bi xemginiyeke bilind nûçeya kuştina rêberê gewre û Xebatkarê gelê Kurd Miş'el TEMO di nav gelê Kurd de belav bû. Ew kuştina reşkarî û çepel hêrseke mezin di dilê hemî lawên gelê Kurd û hezkiriyên azadiyê de rakir. Piştî ku sazûmana zordar û kufkî , nikanî bi gotinê, bi kuştina rêberan û bi wêrankirinê, serhildana xortên azadixwaz vemrandana, wê bawer kiriye ku ê bi kuştina rêberên hişyariya gel kanibe agirê şoreşa gelê Sûrî vemrîne. Lê belê, ji bîr kiriye, ku her dilopek ji xwîna her şehîdekî Sûrî, nemaze jî mirovên mîna nemir Miş'el TEMO, alafa agirê azadiyê hêgin û bilintir dike, û temenê sazûmana destbixwîn jî kintir

Bi navê kovara PIRS û rojnameya NEWROZ û xwendevanên wan, em teltîkêşên hov û destên ku di paş wan de , bi tundî şermezar dikin. Bila serê gelê me û hemî dilxwazên azadiyê xweş be.

www.arsivakurdi.org

Prof. Îsmet Şerîf Wanlî (1924 - 9.11.2011)
Serê Gelê Kurd Sax Be!

Konê Reş

Di roja 9.11.2011an de, roja xwepêşandana ku bi biryara Kongereya Nişтimanî Ya Kurdî Li Sûriyê hatibû pêk anîn û Kurd bi deh hezeran derketin kolanên Qamişlo, doza azadî û serbestiyê dikirin, di eynî rojê de, li Swîsrayê, siyasetmedar û nivîskarê Kurd yê navdar Îsmet Şerîf Wanlî di seat di 04.00 sibehê de li nexweşxaneya CHUV a Lozanê koça dawî kir.

Îsmet Şerîf Wanlî 87 sal kiribûn, ji sala 1948 an de li bajarê Lozana Swîsreyê dijiya. Ew di 21ê berfanbara 1924 an de li gundekî nêzîkî Şamê paytexta Sûriyeyê ji dayîk bibû, di salên zaroktiya xwe de çav bi welatparêz û rewşembîrên Kurd wek mîr Celadet Bedirxan, Qedrî û Ekrem Cemilpaşa, Dr. Ehmed Nafiz û birayê wî Nûredîn Zaza, Elî axa Zilfo.. ketibû û ji wan fêrî Kurdperweriyê bibû û wiha wî jî xwe berdabû nav têkoşîn û berxwedanê di ber gelê xwe de.. Ji sala 1948 ve li derveyî welat bû. Li Swîsrayê di warê felsefe û hiqûqê de dîploma xwe wergirtibû û dersên siyasetzaniyê didan.. Her wiha di salên 1960-1962 an de jî li zanîngeha Sorbonê li ser Kurdnasiyê ders dane.. Di sala 1061 ê de li ser daxwaza Barzaniyê nemir çûye Kurdistana başûr û zîviriye Ewropa nûneritiya Tevgera Başûrê Kurdistanê a bi serokatiya Mela Mistefa Barzanîyê nemir kiriye.. Di sala 1995 de tevlî Parlementoya Kurdistanê ya Derveyê Welat (PKDW) ya ku di 1995'ê de hatibû damezrandin bibû. Di sala 1999 de dema Kongreya Netewî ya Kurdistanê (KNK) hatibû damezrandin. Ew bibû serokê KNK ê û demeke dirêj serokatiya wê kiribû.

Gelek berhem û pirtûkên wî bi zimanên biyanî derketine. Ji wan berheman pirtûka bi navê **Li Tirkiyeyê Pirsgirêka Netewî ya Kurdan** û gelek berhemên wî yên din jî hene. Bi jinek Swîsreyî re zewicî bû û li Lozana Swîsreyê jiyana xwe derbas dikir.

Ji gotinên wî derbarî zimanê Kurdî de: Li zimanê Kurdî û kultura Kurdî xwedî derkevin.. Hemû Kurd, bela li ziman û kultura xwe xwedî derkevin, lê zêdetir divê yên derveyî Kurdistanê lê xwedî derkevin.. Erê, Îsmet Şerîf Wanlî xwendina xwe li dervî Kurdistanê; Libnan, Swîsra, Franse û DYA'yê kiribû wiha jî li xerîbiyê fêrî zimanê xwe yê zikmakî bibû. Li ser fêrkirina wî ji zimanê Kurdî re wiha digot: Her kes li derveyê welêt zimanê xwe ji bîr dike, lê ez li derveyê welat fêrî Kurdî bûm. Di heyamê çetîn û dijwar de Îsmet Şerîf Wanlî dengê Kurdistanê bû, dengê Kurdên rojava bû. Ez xemgînî û mixabiniya xwe ji malbata wî û gelê kurd re pêşkêş dikim û ji Yezdanê dilovan bi hêvî me ku cihê wî bihişta rengîn be û dawî dibêjim: Serê gelê Kurd sax be.

Konê Reş, Qamişlo/ 09.11.2011

Ev gotar ji malpera Welatê me hatiye girtin.

****

Bi boneya sersala 2012an û deh heyvên bi xwîn di ser serhildana gelê Sûriyê dibore re, komîta weşana Newrozê gelê Sûriyê pîroz dike û hêviya serkeftin û sefiraziyê jê re dixwez e.

www.sirvakurd.org

Bi boneya derçûna 100 hejmariya weşna NEWROZê, deslata weşanê ev deqê jêrîn ji hin nivîskarê Kurd yên bi zimanê dê dinivîsin re rêkiribû û emê bersivên wan ji xwendevanên Newrozê re biweşînin.

Ji Dil Hejmara Newroz a 100 Pîroz Dikim

Di destpêkê de, ez sipasiyên xwe ji rêdaksyona rojnameya NEWROZ re pêşkêş dikim û hêviya berdewamiyê ji wan dikim. Bi min xweş e ku ez jî dewla xwe di ava bîra wan rojnameya Newroz de dakim û hin awir û têbîniyên xwe bînim zimên. Li gor şopandina min ji rojnamegeriya kurdî re di nav Kurdên binxetê de, rojnameya Newroz a yekemîn e. Yekemîn e bi temenê xwe ku ev 16 sal in bi berdewamî tête weşandin.. Yekemîn e di zimanê xwe yê resen de.. Di baweriya min de li ser şopa ekola Hawarê dimeşe û zimanekî siyasetê peyda kiriye.. Belê ev rojname nebûye gelêrî, bi tenê di çarçovek rêxistinî û teng de belav dibe.. Rûpelên wê ji çend kesan re vekiriye.. Guhdana wê bi pênûsên nûhatî re kême.. Hem jî dibînim ku, yekemîn rojnameye di nav Kurdên sûriyê de. Li gor vê yekê gerek bi kêmayî her hefte an her 15 rojan carekê bihata weşandin, ne her du heyvan..

Li vir dipirsim: Gelo di pey derçûna 100 hejmarî ji rojnameya NEWROZ û vê buhara azadiyê re ku serê xwe li Sûriyê hildide û wek ku diyare em Kurd netewê duwemîn in di Sûriyê de û pêşiyên me; mîr Celadet Bedirxan gotiye:(Ziman şerta heyînê a pêşîn e..) û Dr. Nûreddîn Zaza gotiye: (Gelî Kurdan! Eger hûn naxwazin ji hev tarûmar û winda bibin, berî her tiştî, bi zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin. Lê eger dixwazin xwe nas bikin û xwe bidin naskirin û hezkirin û bi hevaltî û dostaniya miletên din re pêş ve herin û bi rûmet û serbilind bijîn, dîsa zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin), gelo, wê ji niha û pêve rojnameya Newroz di çi qunaxê re derbas bibe.. Wê bi çi kirasê nû di nav xwendevanan de derkeve..

An wê wek xwe bimîne?! Ka hunê çi mizgîniyê bidin me li gor ku di welat de dibin, di warê çapemeniya Kurdî de û bi taybetî di nûkirina rojnameya Newroz de?

Ji Dil Ez hejmara Newroz a 100 pîroz dikin û bi hêvî me bibe rojnameyek heftname..

Konê Reş

Qamişlo, 07.10.2011

****

Xebatkarên Hêja Yên Newrozê

Pîrozbahiya salvegera weşana NEWROZa hêja ji kanegeha hestên xoşewistiya dilê xwe dikim.

16 sal in, bi dirêjiya temenê xwe, Newroz pencerek bû mala Kurd ronî dikir û hîna jî ew ronî di îse, û xwendevanên xwe bi per û bask dikirin, ji bo raserî mijarên kurdewariyê jîr û behremend birêsin û herçî giriftên me hene, bi çavên dûrbîn binimînin.

Newrozê, bi mijarên xwe yên curbecur, tepsikek ji meyweyên hemereng pêşkêşî xwendevanên xwe dikir. Bi zimanekî kurdî resen dinivîsand, li gorî rêbaza Celadet diçû , û nivîsandina xwe ber bi zimanekî kurdî yekgirtî ve dibir.

Hêjayî gotinê ye, beşdariya piralî ya Newroz di fêrkirin û belavkirina şêweyên resenî derbirînê, zelal kirin peyvên kurdî paye bilind e, herwisa beşdariya Newrozê di zimanê siyasî de pir balkêş e.

Ji hêla xwe ve, ez destxweşiya hemû karmend, berpirs, rêdaksyon û nivîserên Newrozê dikim û hêviya temenekî serkeftî dirêj ji we û Newrozê re dikim.

Derwêşê Xalib

28/9/2011 Qamishlo

www.orsivakurdi.org

Li derdor û perawêza kongira niştimanî ya gelê Kurd li Sûriyê

Dr.Ebdilmecît Şêxo

Eger mirov rexnan nepejrîne , dê şaşiyên xwe pirtir bibin ,paşê ew nikane xwe ji wan şaşiyan rizgar bike …. rexne karekî hişmendî ye û pêdariya rasteqînî ji hiş re , ew e ; ku ew hiş nêrînên cuda bibhîse ,wan nêrînan bixwîne û sûdan ji wan bibîne.

Zênefo

Wek em dizanin ku tevgera azadîxwaza Kurd li Rojavayê Kurdistanê bi awakî fermî di 14 .06.1957 an de destpêkirî ye,lê mixabin di sala 1965 an de dabeşbûna yekê di partî dêmokrata Kurd de çê bû û ew bi van navan (Rast û Çep) di nav gelê me de hatin naskirin .

Li dawiya dawiyê hejmara partiyên me pirtir û pirtir bûn , ango niha ewanan ji 14, 15 partiyan pirtir in . Bê guman perçebûna tevgera me ya dadmend dilsariyek û reşbîniyek di nav gelê me de çê kir, gelek rexne ji aliyê miletê me de arastî rêber û pêşengên partiyan bûn,lewre hin partiyan yekbûn di nav xwe de ava kirin û di pişt re jî hin çarçewên Kurdî ji hin partiyên tevgera me ava bûn(Hevbendî , Enî, Hevrêz, Encûmena siyasî) . Lê divê em bêjin jî; gelek partiyên tevgera me ji zû de daxwaza bestandina kongira niştimanî ya gelê Kurd dikirin,bê guman ew daxwaza; hêviya gelê Kurd jî bû.

Piştî destpêka şoreşa aştiyane li Sûriyê, partiyên tevgera me gavên xwe berve girêdana kongira niştimanî lezandin . Di 26-27.10.2011ê de kongira niştimanî bi beşdarbûna 150 kesayetiyên serbixwe ,yên ku ji hemû qatên civaka kurdî haitibûn hilbijartin û ji sed nûnerên partiyan û di bin sîbera van parolên jêrîn de li Qamoşlê li darket. 1- Ji bo pêkanîna armanca raperîna aştiyane,(azadî û rûmetî) ji gelê Sûriyê re .2- ji bo dewleteke dêmokrat ,perlemanî , geljimar ku di wir de mafê netewî yê gelê Kurd were dupatkirin û parastin .3- Bila di destura dewletê de gelê Kurd mîna pêkhatiyeke netewî û serke were pejrandin û nasîn . 4-Bila cudabûna netewî , olî , ta-îfî tune be!, Bila dewleteke welatparêz ,zanistiyane û dêmokart ji hemû hemweltiyên Sûriyê re hebe ! 5-Bila zor ,lêxistin û zivrûzengî tune be ! Azadî ji hemû girtiyên siyasî re li Sûriyê Kongire ji aliyên hin rîberên partiyan û çend kesayetiyên serbixwe bi bêhneke sincî ,siyasî berferh bi rê ve hate birin û serpereştkirin .

Piştî ku ji aliyê komîta birêvebir de sê pirojeyên belgeyên rêzanî ji beşdaran re hatin xwendin, endamên kongirê di heyameke siyasî û dêmokrat de nêrîn û baweriyên xwe bê perwa li ser hin xalên siyasî derbirîn , serok û berpirsiyarên partiyan bi sîngên berferh têbînî û rexneyên beşdaran guhdar dikirin , piştî gufteguyên şarastanî û rexneyên bajarvanî , ewan kanîbûn guhertin di hin xal û biryarên siyasî de yên pêşkeşkirî de çêkirana.

Ji giringtirîn biryarên siyasî di kongira me de bi van wateyan bûn:

1- Di warê niştimanî de weha hate çespandin ; ev buhrandina (kirîza) welatperwerî û hewşvedayî ku li Sûriyê çê dibe;destlata Sûriyê ji ber wê de berpirsiyar e . ji sala 1963 an de partiya Bes zorê li miletê Sûriyê dike , ewa li dijî baweriyên azad e,ta niha ewê nikanî bû serastkirnên dêmokrat li welêt bi pêkbihaniya ,ewa rêzdariyê li mafên mirovan nagre . Di encama vê zordestiyê de, di 15 .03 2011 ê de pirîska şoreşê li piraniya parêzgeh û bajarên welêt vêket , ev şoreşa daxwaza azadiyê û parastina rûmeta gelê Sûriyê dike . Herweha jî ,kongirê dupat kir; kutakirina vê kirêzê, tenê bi guhertina destlata zordar bi hemû bingehên xwe ve ; rêxistinî ,siyasî , ramanî û ji ji hevşelandina dewlata asayêşî çê dibe û **D..R.(8)**

www.arsivakurd.org

Ji Kurdan re Çend Pirs

Riza Can

Xwendevanên hêja, ez dixwazim di vê nivîsa xwe dۆ ji we û hemû birayê xwe yên Kurd re, çend pirsan bipirsim. Gotinek bav û kalan heye, dibêjin "Mirov bi pirsê, diçê Qudsê" rastî jî wisa ye. Der◦yê rastî û çewtîyan bi pirsan û bi lêgerînan vedibe. Eger mirov ji bo jîyana vê cîhanê, zagonên xweza, gerdûna bê ser û bin, pirsan ji hev pirs neke û li pey deriyê pirsan nekeve, -hûn min bibexşînin- dê têkeve dewsa ajalan. Mirov roja ku ji xwe re gotiye "Ez mirov im" ji bo hebûna xwe ji xwe pirs kiriye "Ez kî me, kê ez afirandime" gotiye; li pey vê pirsê, bi hezaran sal li hêzekî gerîyaye, lê ew hêza, an jî ew kesa nedîtiye. Vêca, çi ku ji xwe hêztir dîtiye, ji xwe re kiriye Xwedê û afirandêr. Di destpêkê de, heya dewr û roja Mûsa, mirov ji xwe re sêsed milyon cure-cure Xwedê afirandiye, ta ku Mûsa bibêje :"Xwedê yek e". Hin kes dibêjin berî Mûsa, Zerdeşt gotiye "Xwedê yek e" lê ez bi xwe ne di wê bawerîyê da me. Li gor baweriya min, di ola Zerdeşt de, du Xwedê hene. Xweda yê qencîyê û Xwedayê bedî û xirabiyê. Her çiqas ku di çar olên Asîmanî, ango semawî de Xwedê û li dij Xwedê, Şeytan jî hebe, lê li gor baweriya min ola Zerdeşt ji zagonên dîyalektîgê re yekeyek hev tê. Ji ber ku di zagona dîyalektîgê de, du alî hene. Dê û bav, xwîşk û bira, asîman û erd, pêş û paş, şev û roj, ronî û tarî. Ango qet tiştek bi serê xwe ne tek, ango yek e. Ji ber vê yekê divê mirov têkeve kûrahiya vê felsefê, pirsan ji xwe bipirse,ta ku rastiyê derxîne holê. -her çiqas ,ku rastî bê dûwayî û mutleq nebe jî.

Xwendevanên hêja, piştî evqas gotinan, ez werim ser hin pirsên me yên hevpar. Gelo em Kurdên îro neviyên kê ne? Me çi wext ji xwe re gotiye "Em Kurd in, welatê me jî Kurdistan e?" Gelo Gûtî, Hûrî, Kussî, Mîtan, Kardûk, Medya, çikê me bûn? "Vana ji mêj ve bav û kalên me bûn" dibêjin. Gelo wan çi diheband, navê ola wan çi bû û ji çi bawer dikirin? Dibe ku di vê babetê de, îro em rastiyekê dernexînin, ji ber ku dijminan hemû tiştên ku me didin nasîn, şewitandine, talan kirine , birine û kirine malê xwe. Berê gelê Samî, li Afrîka Bakûr hatine welatê me Mezopotamya, Akad Elam, Asûr, Babîl, mala me xira kirine, dûra jî Îskenderê Mekedonya û Farisan. Gelo..! di wexta Împaratorîya Medya de , navê ola Medya çi bû? Astîyargersê zalim çi diheband? . Gelo bêbextiya ku îro em Kurd di nav xwe de dibînin, di wexta Astiyagers û Harpagos de ji me re mîrat ma ye? Li milê dî, piştî ji holê rabûna Medya ,em tev kîjan gelî bûn? Di destpêka ola Xaçparêz de, bav û kalên me çi kirin, çira nebûn Xaçparêz? Ji bilî vê, di destpêka sedsala heft, ango piştî sala 612 hîcrî, ola Îslam bi çi rengî hat ket nav gelê Kurd? Kurdan çito ev ol hebandin? Bangeşiya vê olê di nav gelê Kurd de, kê kir? Kê zimanê erebî dizanîbû? Mekezagona Îslam (Quran) di nav gelê Kurd de çito belav bû û çend hezar kesan ew pirtûka xwendin, şîrovekirin û ji gelê xwe da bawer kirin? Gelo gelê Kurd ji ola Îslam re "Tu bi xêr hatî, ji artêşên wê re "Hûn bi xêr hatin Kurdistanê?" got. Gelo...! Bi hatina wan artêşan re, çend sed hezar Kurd hatin kuştin? Çend sed hezar serî û ziman hatin jêkirin, serî kirin ser qazixan di navbera riya Xarpit, Mûş, Sêrt, Betlîs û bajarên din da tîk kirin? Gelo Kurdan di sala 1071 da çira ji Tirkên barbar re alîkarî kirin, bi tev wan leşkerên Bîzans li welatê xwe derxistin, ew birin Anadolê li ser erdê Yewnan kirin xudan dewlet, li serê xwe kirin bela, îro jî di bin zilm û zora wan da dinalin. Welat talan bûye, di dewsa ciyê merdan de nemerd, di dewsa şêran de çeqel, di dewsa bazan de **D.R.(7)**

www.sersvekurd.org

da çûk bûne serdest û desthilatdar? Çira Padîşahê Osmanî Avdilhamîd bi xortên Kurdan, Alayîyên Hamîdî damezrand, bi destê wan qira gelê Ermenî, Kurdên Êzîdî, Elewî û Sûryaniyên Xaçparêz anî? Çira îro di ciyê bilbil, şalûl û kewan de kund, ango bûmê kûr dixwînin, beraz tijî bûne? Çira Şêx Memûd Berzencî û Simko Axa hatin xapandin? Çira Mistê Kûr ew xapandin, kirin dijberê Îngîlîz, bi xwe jî bû yar û dostê wan,û dewletek namerd û zalim li ser tunebûna me Kurdan damezrand? Çira 72 gelnişên Kurd, -ku ew bi deng û viyana gelê Kurd ve neçûbûna wê meclîsa zalim û barbaran- ango parlamenterên Kurd ji Konferansa Lozanê re name şandin,û gotin "ev dewleta, dewleta me Kurdan û Tirkan e?". Çira Kurdistan kirin çar parçe, pergala me belav kirin,û em kirin xulam û bindestê sê zaliman?.

Bawer bikin rewş û tevgera me Kurdan gelek balkêş e. Em ji keçek xwe, a ku bi xwasteka dilê xwe bi yekî Kurd re direve, em diçin wî xortî dikujin, dibin dijminê wê malê û dû re jî, ji hev tol û qesas distînin. Lê,yên ku bi sed hezaran bav û kalên me kuştine, îro me ew ji xwe re kirine dost, heval û yar, ji xwe ra kirine rêber û pêxember. Ez ku bibêjim "Em Kurd ji celatên gelê xwe hez dikin û dihebînin" ,bibe ku gelek Kurd bixeyidin, lê mixabinev rastiyek berbiçav e. Aha ji we re îro Kurdên Dêrsimê, ku Mistefa Kemal li Dêrsimê heftê hezar (70.000) Kurd, zar û zêç, pîr û kal, jin, keç û bûk kuştin, lê îro Kurdên Dersim bi serê Mistê Kor sond dixwin, û wî dihebînin.

Belê, li ser vê rewşa me, -di nav demek xweş de be- Îsmaîl Bêşîkçî gelek tiştên xweş û berbiçav nivîsî ye.

Xwendevanên hêja, pirs gelek in, lê ez naxwazim pir dirêj bikim, werim ser hin pirsên îro. Çira çar hezar gund hatin şewitandin û kavilkirin û pênc-şeş milyon Kurd bûn koçeber çûn ketin ber çerxa asîmîlasyonê, ango helandinê? Çira 90 hezar Kurd bûne parêzkarê dijmin? Çira şerê birakujiyê destpê bû,û bi hezaran Kurdan hevdu kuşt? Çira heya roja îro hemû hêzên Kurd, yên ramyarî di nav xwe de Konseyek Neteweyî saznekirin û pêknanîn? Çira di nav hêzên Kurd de nakokî hêj berdewam e? Çira heya roja îro Kurdan dost û dijminên xwe ji hev cihê nekirine, li hev qelibandine?

Xendevanên hêja ew kesê ku dost û dijminê xwe nasneke, riya mala heval û hogirekî nabîne. Ji ber vê yekê divê êdî em gelê Kurd dost û dijminê xwe ji hev cihê bikin,da ku em bi serkevin. Ango piştî evqas şaşî û çewtiyan, piştî evqas sal û sedsalan ,divê em hişê xwe bînin serê xwe, bi xwe bihesin û xwe nas bikin, ji hevra bibin bira, dost û yar.

Xwendevanên xoşewîst, berê ku ez dûmayî bidim vê nivîsa xwe, dixwazim ji we re qal û behsa gotin û fermanek Peyxamberê ola Îslam û kurap û zavayê wî Elî bikim. ?

Ez werim ser fermana Peyxamber, û wî ji Elî re çi gotiye û Elî çi kiriye? . Rojekê Mihemed ji Elî re: Elî, îro şuve bikeve nav gel û bala xwe bide ser gotinan. Eger ku te dît kesek sê derewan li ser hev dike, yekser lêxîn bikuj, sêrî jêke" dibêje. Êhh, Peyxember ferman kiriye, divê Elî fermana Peyxamber bîne cî.

Rojekê Elî li Dundulê siwar dibe - Dundul di rastiyê de ne hesp e, qantir, ango kerbav e- li Mekê derdikeve, dinêre ku kawranekî hêştiran berbi bajêr tê, li pêş kawrên **D.R.(11)**

www.arsivakurdi.org

li dewsa wê(destlata zordar) avakirina dewletek zanistî , dêmokratî , perlemanî bi baweriyên cuda û li ser bingheke ne navendiya siyasî , ne riçperest ava dibe û herweha jî divê li şûna vê dewleta setemkar , dewleta dezgehan û yasa pêk were. .Herdîsan kongirê dewleta Sûriyê daxwaz kir ku pêwîste ewa hemû hêzên leşgerî û asayêş ji bajaran vekşîne .

2 –Di sebaret gelê Kurd de; kongira niştimanî weha dupat kir : Gelê Kurd li Sûriyê resen e , ew li ser axa xwe ya dîrokî dijî û ew beşek e ji pêkhatiyên civakî , niştimanî li Sûriyê, lewra pêdivê hebûna miletê Kurd wek pêkahatiyek sereke ji pêkhatiyên gelê Sûriyê û ewa mîna netewa duhem di desturê de were pejrandin .Herweha divê çareseriyek dêmokrat û dadmend ji doza netewayetiya gelê Kurd re were dîtin ,herwisa pêwîste di vê çareçewê de, mafê çarenûsî ji gelê Kurd re di hundir yekitiya welêt de were dupat û tekuz kirin.

3-Kongirê got: Ji ber ku liv û bizavên xortên Kurd beşeke ji şoreşa aştiyane li Sûriyê ye, divê em piştvaniya bizav û livên wan bikin. 3- kongirê dupat kir ,ku divê serbestiya baweriyên olî , rêzgirtin û parstina wan di desturê de hebin, herweha jî divê mafên netewî ji gelê Suryan -Keldo - Aşurî û kêmnetewên din re werin parastin.

Dîsan jî, kongirê biryarek rêxistinî pir giring istand ; ango ewê got:Bila hemû çarçewên rêxstinên Kurdî ji holê rabin û nemînin 1-(Enî),2-(Hevbendî), 3-(Hevsazî), 4- (Encûmena siyasî).

Di dawiyê de, kongirê hevdîtin û hevpeyvîn bi çarçewên rêxistinî –niştimanî yên rikbir re spart (Komîta pêkanînê),(ya ku di kongirê de hatiye hilbijartin)û eger kî ji rêxistin û çarçewên niştimanî yên rikbir, pirtir biryarên kongira me bipejrîne , divê hevkarî û hevsazî bi wan re çê bibe .

Di 11.11.- 12.11.2011(komîta pêkanînê ji (45) endaman) civîna xwe dîsan li li darxist, di vir de danûsatandinên berferh li ser rewşên rêxistinî û siyasî çê bûn;di encamê de ,biryarên giring hatin istandin. 1- Divê hin heval bi navê kongira niştimanî ya Kurd têkeliyan bi hemû partiyên din û hevsaziyên xortan re (yên ku di kongir de beşdar nebû ne) bikin û pêdivî ew deriya kongira niştimanî ya Kurd li Sûriyê ji wan re bê perwa vekin .2- (Komîta pêkanînê) ji biryarên komkarên welatên erebî dilxweş bûn ,lewre jî ,di vir de biryar hate standin ,ku pêwîste nûnerên kongira niştimanî li komcivîna (Komkarên welatên Erebî)beşdar bibin .

Lê ,ji ber ku komcivîna welatên Ereban pir nêzîk bû, tu kesî ji endamên (Komîta pêkanînê)nikanî bû xwe ji bo beşdarbûnê pêşkêş bikira , lewre jî ,(komîta pêkanînê)(6) kes ji Ewropa û endamê (komîta Pêkanînê) rêzdar Ebdil Hemîd Derwîş (niha li Kurdistana Başûr e) pêşniyar kir ku ewanan li komcivîna welatên Erebî beşdar bibin, deng û daxwazên gelê Kurd bi serdar û berpirsiyarên welatên Ereban û bi hemû hêzên erebî -Sûrî yên rikbir bidin bihîstin. Dawiya civînê de, komîtek çûktir ji (23) endaman; (11) endam ji partiyên kurdî,(12)endam ji kesayetiyên serbixwe bi navê (Nivîsgeha parêzrwerî (Amandarî ,pişterast) ya giştî) ji (Komîta pêkanînê)hate hilbijartin.

Di dawiyê de pir pêwîst e û cihê balkêşiyê ye ku em bêjin ; Kongira me ya niştimanî û civîna (Komîta pêkanînê) pir di heyameke dêmokrat de derbaz bûn, rexne û sirincekêşî bi şêweyên vekirî û zelal dihatin holê,rêberên partiyên me û kesayetiyên serbixwe bi bêhna fereh danûstandin dikirin û rexneyên hevdû bi hilmên xweş û bê awirdan dipejirandin û sûdên rêxistinî û siyasî ji hev didîtin,lewre jî li dawiya dawiyê kongira me biryarên hişmendî , ramyarî li gor gengazî û taybetmendiya rewşa gelê Kurd ji pir aliyan ve li Sûriyê standin.

Di paşgotinê de, divê em ji gelê Kurd li Sûriyê re bi kêfxweşî bêjin ; KONGIRA NIŞTIMANÎ YA KURD LI WE PÎROZ BE ! 13.11.2011

www.arsivakurd.org

SÎNORÊN RÊZGIRTINÊ

Enehîta Morad

Vaye demsala Havînê bi şewib û germiya xwe ,bi serpêhatî û bûyerên bi jan ve, bi melîlî xwetir dixweze û diçe. Wisan jî, demsala payîz- xêrê,li me dibe mîvan . Ji berê û paşê ve, bapîrên me digotin: Vaye payîz-bi xêr hat, pir pirisgrêkên me yên aloz bûne wê çareser bibn . Weha bi hêviyên bilind, ew li benda xêr û bêrên payîzê diman, ku baran bibare û xêrûbêr pir dibin ?.

Yanê demsala payîzê nîşana hêmenî û geşkirina armanc û hêviyên mirovan e !. Lewre jî, de bila demsala payîzê bibe demsala rizgarî û azadiya gelê Sûriyê çi Kurd , Ereb , Aşor , .. û H.W.D binzordariya ev rijîma bêbexit û ne mirovane ku, bêtirî şeş heyvane , ew mîna hirç û hovan bi hemû reng û awan teroriya xwe li serê hemwelatiyên reben û dest-vala dikin û dimeşîne!. Bêcudahî û şermî wê, gelê Sûriyê di gel zarok , jin ,kal ,pîr dane ber xwe! Vê rijîmê bêgûman ji zû ve, sînorên rêzgirtina mafên mirovan çirand û bin pê kirine,bi bîr û baweriya me be, evton rijîm ji sala -1963-an ve,wê ferman û zagonên awarte û kufikî, bi darê zorê li serê gelê Kurd meşandine .Di sala -2004- an de ,dema vê rijîmê bêsûc û guneh bêtirî -30-î ciwanên Kurd dane kuştin û bi dehan jî birîndar ,girtin H.W.D!. Weha jî, ew îro li pêş raya giştî ya der û hundir tazî şermeze û riswa bûye û hê jî dibe .

Nema ku rastiya wan totelîstan bin cil û feşirtî dimîne. Ango jî, ew îro bê fedî aşkere destên xwe yên bi qirêj û gemar dirêjî zarok , keç û jinên Sûriya me dikin . Wan davêne binê hepis û zîndanan , ew li ber darê îşkencê dibine qurban! Weke mînak û nimûne ew keça nazdar Zeyneb Elihusnî, çi heyf û mixabin ku hê di destpêka buhara temenê xwe de bû , bê guneh ew didane ber darê îşkencê û laşê wê parî –parî dikirin, vêca jî ew dibû qurbana azadî .

Ma gelo ! Ev yeka li kîjan olî û zagonan têye pejirandin ?. Dîsan heyf zeyneba min, heyfa canê nazik ku çiqas birîn lêdikirin?. Ma hawara te nediket guhên hêz û dewletên bi namûs ku , wan çi bê fedî çavên xwe li ser rastiyê dadimrînin û guhên xwe li pêş hawara dengên mîna te digirn, tenê ew li peyê berjewendiyên xwe mîna rûviyan dibezin, ne wilo?!. Belê, Zeyneba min de rihet çavên xwe damirîne û raze , ew tol û heyfa te û hemû nemirên azadiyê, wê werine hildan, û yê bi xêra vîn û armancên gelê Sûriyê yê dilêr û leheng nemaze kesên mîna te û Hemze, ku îro win li pêş raya giştî bûne simbola azadî , di dil û hişê her mirovekî bi rûmet de çîhekî bilind digirn .

Ma kî nizane ku, ji berê û paşê ve , dema ceng û şer lidardiketin, peyman ew bû ku destdirêjiya keç , jin , û zarokan nekin û eger hinan rêzgirtina wa peymanê negirtana, ew di kastîna bajaran de û li pêş çavên xelkê sûcdar û şermeze dibûn û çihê wan binê zîndanan bû , an jî, kuştin bû ?. Weke mînak : Hema bi kurtebirîn em dûr neçin , berî çêl pêncî salî li va Sûriya me di bûyer û wergerînên ku li pey hevdu dibûn, di hevdema Husnî Zeîm , Şukirî Quwetilî , Noridîn Atesî û H.W.D hîngê heyamê Sûriyê dikelî û pir dijîtî û girtin çêdibûn. Li encama wê yekê , wergervan û partîzan nikarîn liv û çalakiyan bikin, wisan jî di riya keç û jinan re çalakiyên xwe weke weşanan, nûçe û H.W.D . pêktînan, an jî cilên jinan li xwe dikirin, ta ku ew becawîş û neyêne naskirin , ji ber ku destdirêjiya li ser jinê , li wa hîngê, ne gengaz bû . Lewre jî, rêzgitina jinê di nava civaka Sûriyê de, kêm zêde cî digirt ,. Çi mixabin, îro Sûriya me, ji hêla vê rijîmê ve, bûye kastîna dijiberî , teror û destdirêjiya li ser hemwelatiyan, û bêcudahî !, Heyif û pir mixabin ku , gelê Sûriyê di deriya xwîna ciwanên xwe de , vedigevize û hê jî raya cîhanî serûber çiqas cihê mixabiniyê ye.

www.sirvakurdi.org

Dumahîk: Sazûmana Beşar

giring, helwestîn xwe di warê guhertinên siyasî û çalakiyên xwe jî di nava raperînê de, li ber roniya wê hatin ava dikirin, mîna "desteya hemsazî ji bo guhertina demokratik li Sûriyê" û hwd..

Di wê karnavê de, tevgera nîştimanî ya gelê Kurd li Sûryê jî di wê baweriyê de de bû, hemî partî û rêxistinên wê jî, pilanameya xwe ya ji bo guhertina sazûmanê, bi serkêşî û serperştiya serok komar pîşniyar kir. Û ra piştî dora çend mehan ji serhildanê, û belkî ra niha jî, hîn bawerî bi guhertina sazûmanê bi serkêşiya serok komar û ji hundurê wê de li ba hin aliyên rikbera Sûrî li cihê xwe ye, wek mînak, "kongira nîştimanî ya Kurdî" li ser wan hêviyan hat girêdan.

Lê belê, piştî borîna bêtirî deh mehan di ser serhildana gelê Sûrî re, û herikîna lehiyên xwîna xwepêanderên azadîxwaz ên sivîl li ser destê destlatê, serok komar û sazûmana wî, pêşniyarên guhertina bingehîn ji ti kesî qebûl nekir, û wî bi xwe jî ti guhertinên giring û pêwîst di hundur xwe de ne kir, li bervajî wê, sazuman li ser gotina "li dijî Sûryê pilaneke navdewletî heye" û hîn jî bi îsrar e, û li ser wê binyatê, hemî şêweyên tundûtûjiyê li dijî rikber û xwepêşanderan bi kar tîne. Di vê karnavê û di van deh mehên şoreşê de, mixabin, bi hezaran qurbanî ji xwepêşenderên sivîl û leşkerên artêşê, û çakdarên sazûmanê ketin, bi deh hezaran girtiyên serhildanê di girtîgehên dewletê de hene, û gelek şêngeh û bajarên mezin jî hatin bumbebarankirin, ji bilî wan hemî tiştan, dewlet jî û civak H.WD de çûne ber heraftin û hilweşînê.

Li roja îro, pirsine giring li ser zimanan digerin, û ji gelek aliyên siyasî tên kirin, jê: Hîn hêvî heye ku sazûman ji hundur ve were guhertin? Eger bersiv erê ye, kanî qelewîzên wê çi ne? Lê eger bersiv na be, gelo! dem ne hatiye ku hêvî ji sazûmanê were birîn, û daxwaza "rûxistina sazûmanê" bibe dirûşm her aliyekî siyasî, eşkere were hildan, û xebatek xurt û hevbeş ji ber ve were kirin?

Rozad Elî

Komkujiya gundê Roboskiyê

Ji ber zordarî û tunebûnê, li hemî welatan, egundiyên sînoran, tiştan ji wlatên xwe di sînoran re debas dikin , an jî tînin. Sînorê Tikiyê û Îraqê ji kevin ve, qaçqê dibe.Ji bo berdewamiya jiyana xwe, mazot û paketan ji wir tînin û li Tirkiyê difroşin. Di 29 ê Berçile de, destlataTirk bi balefiran, gundiyên Roboskiyê – herêma Şirnexê – yên li ser sîror bobekirin û ji enjamê 36 gundê hatin kuştin.Tevî destlata Tirk , aşkerekir ku, bi şaşitî ev bûyer bû ye. Lê, ev ne cara yekê ye ku, ev reng kar destlat dike.
Bi navê rêdeksiyona Newrozê û hemî xwendevanên wê, em vî karî şermezar dikin û bila sere xwediyên wan sax be.

www.arsivakurdi.org

Dumahîk : **Ji Kurdan re….**

mirovekî pîr î îxtiyar, heştê salî, pê hevsarê kerê girtiye û dimeşe, li pey kawran neh-deh xortên ciwan dimeşin tên. Elî wexta ku nêzî kawran dibe, ji mirovê kal re:

- Selam û eleykum ya pîr î îxtiyar dibêje, îcar pîrê

Kal:

Eleykumselam ya Elî dibêje. Ji ber ku wî bi şûrê wî yê du çetel, nav Zulfiqar ve nas dike. Li pey silav dayîn û ragirtina silavê, îcar Elî:

- Ya pîr î îxtiyar temenê te, ango salê te çend in? pirs dike, îcar îxtiyar:

- Ya Elî salên min çil, ez çil saliyê de me.

- Êh, va hêştirana ê kê ne? îcar îxtiyar:

- Tenê hêştirek min di nav van de ye dibêje, îcar Elî:

- Va xortana kurê kê ne? dibêje, îcar îxtiyar:

- Ya Elî di nav van de, tenê kurekî min heye dibêje, îcar Elî şûrê xwe dikşîne ku serê kalo jêke, kalê îxtiyar yekser bi qêrîn:

- Tu dixwazî çi bikî ya Elî ? îcar Elî bi hêrs:

- Fermana Peyxamber e. Her kî ku sê derewan li ser hev bike, divê ez serê wî jêkim bifirinîm. Te bi xwe jî sê derew li ser hev kir got, îcar îxtiyar:

- Sê derewên çi?

- Kuro salên te heştê ye, te got "Ez çil salî da me" hêştir giş ên te ne, te got "Tenê hêştirek min di nav de ye. Hemû kurên te ne, te got "Tenê kurekî min di nav van da ye" got bi hêrs, îcar pîrê kal:

- Rast e ya Elî, ez kalekî heştê salî me, lê çil salên xortaniya min di nav nezanîyê de derbas bû, ez piştî çil salî bi xwe hesîyam û min xwe nas kir. Ji ber vê yekê ye ku ez dibêjim ez di çil salî de me got, îcar Elî:

- Berat, lê va hêştirana ên kê ne? vêca dîsa îxtiyar:

- Ya Elî evana giş hêştirên min in, lê vana malê vê cîhanê ne, çu hêjayiyek malê vê cîhanê tune. Eger ku bi rastî axiret, cîhanek dî heye, di nav van hêştiran da min hêştirek nêt kiriye qurban, bibe ku ev qurbana li axiretê, di wê cîhana rast de bikeve ber gunhekî min. Ji ber vê yekê ye ku ez dibêjim " - Êh berat, lê va xortana kurê kê ne? Îcar îxtiyar:

- Ya Elî vana giş kurê min in, lê hemû bê xêr in, bê ol û îman in, tenê kurê min ê biçûk lawikekî dilsoz, xudan bîr û bawerî, ji dê û bavê xwe re jî rêzdar e. Ji ber vê yekê ye, ku ez dibêjim "Tenê kurekî min heye" dibêje, Elî jî:

- Ê baş ya pîr î îxtiyar berat dibêje û xatir dixwaze, ji kalo dûrdikeve, gelş li vir dûwayî dibîne.

Xwendevanên hêja çira min ev çîroka nivîsî? Ji bo me Kurdan. Çito ku kalo ji Elî re"Ez piştî çil salî bi xwe hesiyam" got, divê em jî piştî evqas şaşî û çewtiyan bi xwe bihesin, dost û dijminên xwe nas bikin, ji hev re rêzdar bin, pirengî û pirdengiyê bipejirînin. Divê em hevdu hezbikin, geznekin û nêşînin, daku em serkevin, wek hemû gelên azad û xwedan dewlet, em jî bibin xwedan dewlet û dezgeh.

****

Keçeke Vêtnamî di çend rojan de pîr bû

Rojnameya Toi Try ya Vêtnamî ku yek ji mezintirîn rojnameyan e ku li Vêtnamê derdikeve, diyar dike ku , keça ya bi navê Nujween Taiin Fong , di sala 2008 de xwarineke deryayî xwar, piştî çend setan, dema ku di neynikê de li xwe kir, dît ku rûyê wê qermiçî ye, di nava çend rojan bû pîreke 3 caran ji temenê xwe mezintir .

Ev nûçe jimalpera Avesta Kurd hatiye girtin

www.arsivakurdi.org

Rûpelek ji lênûsa min

Rêberê Silîvî

Beriya derdora 20salan, rewşenbîrekî Kurd, cilda 1ê ji kovara"JÎN" ji bo dîtin û xwendinê da min,weke mirovekî tî ku di kelkela germa havînê de taseke ava sar têkeve nava destên wî, bi dilgermî min rûpelên wê kovarê ji ser hev rakirin, xwendin û pir pê şa bûm.

Bi rastî jî kovara JÎN, ji min ve ne diyar bû, min jî –mîna gelek Kurdan- pê ne bihîstibû. Kovar di roja 07.11.1918an de bi zimanê Kurdî û Tirkî li Istanbolê çap û belav bûye, sernivîserê wê mamoste Hemze Begê Muksî bûye, her heftê carekê derdiket. Ji hejmara 1ê ta hejmara 20an, kovar bi serokatiya Hemze Begê bû, ji hejmara 21ê ta hejmara 25an, bi berpirsiyariya hêja Memdûh Selîm kovarê berdewam kiriye. Piştî hejmara 25an, kovar nema hatiye weşandin û ketiye bin perê ewrên reş û tarî û hatiye qedexkirin. Jîna JÎNê, ji 07.11.1918an dest pê dike û li 02.10.1919an bi dawî dibe.

Ronakbîrê Kurd ê hêja M.Emîn Bozarslan ew kovar di 5 cildan de kom kiriye, bi dirêjî li ser peyivî ye. Mala wî sed carî ava be ku wî ev karê mezin pêk aniye, nehiştiye ev rûpelê xweşik ji dîrok û wêjeya Kurdî winda bibe.

Babetên kovarê yên bi zimanê Kurdî gelekî hêja û giranbuha ne, nemaze gotar û helbestên mamoste Ebdirehêmê Rehmî. Vî hozanê payebilind, li Kurdan kiriye bang û hawar daxwaza hişiyariyê li wan kiriye, daxwaza têgihiştin û zanînê ji gelê xwe kiriye, daxwaza girînê ji gelê xwe kiriye…Lê çi girîn?!!.. Ne ew girîna ku em wê dinasin, lê belê qêrîn li gelên cîhanê ji bo ew piştgiriya doza Kurdan bikin. Ewî nivîskarê hêja ev bîr bawerî û ramanên xwe di gotara bi sernavê "Biçûk ne girî, memik naxut" anîne zimên.

Bi rastî, dilê min bi xwendina JÎNê şa bûye, baweriya min xurtir bûye ku gelê me yê gewre yê ku evqas zana û dilsoz afirandine, miletekî sax e û bêgoman wê armanca xwe bi dest xîne, wê armanca pîroz a ku van mezin û nemiran jiyana xwe di ber de fena kirine…Wê rojê, divê gelê me wan fêris û zanyarên ku derdê gel û welat bi wan re çûye gore ji bîr neke û ji wan re dilsoz be… Ez bawer im ku wê pûtên wan comerdan baxçe û gastînên Kurdistanê bixemilînin.

Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re , yên di girtîgehên Sûriyê de

www.arsivakurd.org